

Vaksîna Bihêzker

- Komîteya Rêvebir a Vaksînkirinê pêşniyar dike ku hemû kesên 18 salî û jê mezintir vaksîna "peyamnêr RNA" ya bihêzker bigirin.
- Ji bo ku bikaribin bigihîjin vê, dive herî kêm şeş meh berê vaksîna duyem li we hatibe kirin.
- Kesên bi pêşanî yê vaksîna bihêzker ev in:
 - Kesên 70 salî û mezintir,
 - Kesên ku li malên xwedîkirinê, navendên entegrasyona civakî û tesîsên din ji bo komên di bin xetereyê de dijîn an jî li van tesîsan miqate ne an jî li wan dinêrin, ligel
 - Mirovên xwedan sîstemên parastinê yê qelsbûyî.
- Dema hûn ji bo vaksîna bihêzker werin ji kerema xwe belgeya nasnameyê ligel delîlên xwe bînin ku nîşan bidin we vaksîna yekem û duyem girtiye.

Pirsên we hene?

- Hejmara telefonê 116 117
- www.zusammengegencorona.de
- www.rki.de
- www.dranbleiben-bw.de



Agahdariyên nûjen ên pêş de

dikarin li ser malpera me bîn dîtin
www.alb-donau-kreis.de



Bi selameti bimînin.

Spas ji bo hevkarîya we!



Mohr

Weşanger: © 11/2021, ofisa hikûmeta herêmi ya mehleya Alb-Donauyê, beşa ji bo ciwanan û xizmetên civakî / penaber, entegrasyon û xizmetên dewletî
Rêzkirin û tîpkirin: Johannes Kiefer
Werger: ORBIS Fachübersetzungen
Wêne: blackday, rido, ocskay mark (stock.adobe.com)
Çapkirin: WIRmachenDRUCK GmbH, Backnang



KURDISCH



AGAHDARÎ

LI SER VAKSÎNA KORONAVÎRÛSÊ
EDISYONA 2.0

Beşa karûbarên civakî û ciwanan

Yekeya taybetî ya penaberan,
entegrasyonê û xizmetên dewletê



Hevwelatiyên hêja,

Ev pirtûkçe di derbarê vaksîna (derzî, aşî) koronavîrûsê de agahdariyên girîng dide we.

Vaksîn (derzî, aşî) awayê herî bibandor e ji bo avakirina parastina dijî koronavîrûsê. Vaksînbûyîn dikare pêşî lê bigre ku hûn ji ber nexweşiya girîng êş bikşînin.

Ew dê we û malbata we ligel mirovên din, bo nimûne mirovên ji berê de nexweş û pîr biparêze.

Vaksîn yek ji awayên herî hêsan û bibandor e ji bo avakirina parastina li dijî koronavîrûsê.

Her kesê vaksînbûyî dibe alîkar ku zexta li ser pergala tenduristiyê kêm bibe - bo nimûne li nexweşxaneyên me. Û ji ber vê yekê em hêvî dikin ku em ê bikaribin gav bi gav vegerin rewşa normal.

Girîng e ku li dijî koronavîrûsê parastineke dem-dirêj were avakirin. Em dikarin bigihîjin vê yekê heke gelek mirov xwe vaksîn bikin.

Ji ber vê yekê ji kerema xwe, xwe vaksîn bikin!

Ulm, 19ê Çiriya Paşîna 2021an



Agahdariyên girîng

Kî dikare vaksîn bibe?

- Komîteya Rêvebir ya Vaksînkirinê (STIKO) pêşniyar dike ku her kesê 12 salî û jê mezintir divê werin vaksînkirin bêyî ku sedemên tibbî ji bo nekirina wê hebin.

Ez dikarim li ku vaksîn bibim?

- li miayenexaneya bijîşkê malbatî,
- li klînîkên taybet ên xizmetên tendurustiyê
- li tesîsên tendurustiyê yên cihê we yê kar
- li klînîkeke vaksînkirinê ya xwecihî

Kî heqê vaksînê dide?

- Vaksîn belaş e.

Divê ez bi xwe re kîjan belgeyan bînim ji bo hevdîtina xwe ya vaksînê?

- Belgeya we ta vaksînkirinê (heke hebe)
- Kartê endamtiyê ya fona nexweşiya we / belavoka agahdariyê ji bo nişandana doktor.
- Belgeya nasnameyê (qertê mayînê, qertê mayîna dem-kurt / qerteke taybet ya destûra mayînê, pasaport hwd.)

Vaksînkirin

- Hemû vaksînên pejiwandî bibandor in û xwedan riskên kêman in li gor dîtînan zanistî yên herî dawî.
- Ji bo piraniya vaksînan lazim e ku çend hefte piştî vaksîna yekem hûn vaksîna duyem li xwe bixin.
- Mirovên vaksînkirî dibin alîkar ku pêşî li belavbûna koronavîrûsê were girtin.
- Di gelek rewşan de vaksînkirin li hember nexweşiyên ciddî mirovan diparêze.

